

Dîroka zimanan, û zimanê Kurdî xwe li kû dibîne

Memê Alan

Ji destpêka afrandina zimanan de û ta zimanên **îroyîn** ku li cîhanê dijîn, zimanzan pêvajoya wan weha dişopînin û berbiçav dikin. Li pêşî, zimanan dabeşî ser sê komên sereke dikin: **yekem**, koma zimanê Hamî û Samî: Ji vê komê du zimanên serekîn peyda dibin û jîndar dimînin, ew jî evin : Zimanê Erebî û zimanê Ibrî .

Koma diwem: koma zimanên Ûral – Altay – **koma siyem**, koma zimanên Hind –Ewropî: Ew jî di pêvajoya xwe de. Parve van zimanan dibe: Inglîzî, Almanî, Latînî, Sansikrîtî û beşa zimanên Îranî. Zimanên Îranî jî di dirêjîya pêşketina xwe de, bi du rengan ji hev hatin cudakirin . Li gorî serdema xweyî dîrokî li ser sê serdeman (kevnar, navîn û nû) dabeşbûn. Û li gorî xaknîgariya ku lê belavkirî, bûn çar par, zimanên Rojhilat, Başûr, Bakur û Rojava. Zimanên Rojava yên Îranî ji aliyê xwe ve bûn du beş, Bakur - Rojava û Başûr-Rojava, Ji beşê Başûr-Rojava Farisî û hin zimanên dî hatin der, û zimanê Farisî di serdema xwe de hate guhertin, û di sê pîledemên zimanî re derbas bûn. Pêşî ew bi zimanê Medî û partî, partî jî di serdema wê ya îroyîn de, ev ziman Belûcî, Tatî, Gilokî, Talîşî ,û Kurdî jê çêbûn. Herweha li gorî xaknîgariyê zimanzan û zimanasên zimanê Kurdî wê dikin sê bir, Bakur, Başûr û naverast. Lê, şerefxan Betlîsî di Şerefnama xwe de, zimanê Kurdî dike çar zaravên serekîn, Kurmanc, Lor, Kelhor û Goran. Mamoste Samîtan wê weha parve dike: Kurmanciya jorîn, jêrîn, Goranî (Hewremanî), kirmanckî (dimilkî) û lorî ...û H.W.D .

Hêjaye em bi bîr wînin, ku gelek zimanzan, zimanê Kurdî, yekser bi Medî ve girêdidin . Di bawerîya min de ev nêrîn dûrî pêvajoka zimên e. Ji ber ku, tu ziman di pêvajoya xwe de weke xwe nema ye. Ew weke hertiştê di gerdûnê de, hertim hatiye guhertin, yan zimanin dî jê çêbûne, yan jî ew veguhestiye

zimanekî dî. Herweha ez kanim bibêjim, ku zimanên îroyîn, ku di xaknîgariya zimanên Îranî tê de hatine afrandin, mîna Farisî û Belûşî û H.W.D, xizimên zimanê Kurdî ne .

Dara pîroz

Birasozê Sirûcî

Kurdistan dara bihn xweş e, ku di her demsalê de kerase xwe diguhêre ser kesk, sor û zer ve û li her deverê Kurdistanê cihê xwe digre. Bihna xweş a AZAD , RIZGAR, û SERBIXWE difûrîne pozê her mirovekî Kurd.

Kûraniya koka xwe ji ya volkana yekemîn a di vê axê de teqiyayî hilgirtî ye, û çiyayên Kurdistanê bejna xwe ji wî agirî saz kirine. Lewra Kurd di roja ku ev dar çandine de, agirê wê volkanê bi bîr tînin, şahiyên li dardixînin û bi tevî mûman li dor vê darê dicivin. Ev roj, roja çandinê, roja ku roj şev wek hev dibine: Ji alîkî ve, şev dibe roj, ji ber ku ronahiya agirê, çandina darê, tarîbûnê li pêş çiyayê ku di nav ewra de winda bûne, tîrêj bi tîrêj dike û li pêş rêwiyên di nav zeviyên bê av de wenda dike. Lehiyên leylava berfê, şaxên xwe dikolin û nema zevî û daristan bê av dimînin. Ey AVDAR çima Ferat dîn dibe û Dicle xwe ji xwe derdixîne!?

Ji aliyê din ve, li gorî zanistiya felekê, dirêjbûna roj û şevê jî wek hev dibin. Ango, tu cidabûn li hember agirê volkanê, di şahiya çandina dara Kurdistanê de namîne. Nema yên dar û gulan hildikin ,dê bêjin reş û gewr (sipî), dirêj û kin, mezin û biçûk, nêr û mê ,...H.W.D Gelo ma tiştik di jiyane de heye, ku bibe bend li pêş belavbûna bihna gulan !!??

Bi kurtayî, mirov kare bêje dara Kurdistanê dara AZADÎ, WEKHEVÎ, û AŞTÎ ye. Dara serxwebûn û rêzgarkirina deşt, çiya, mêrg, gelî, zevî û daristana bê av e.

Hêjayî gotinê ye, ku em bêjin dara Kurdistanê dara PÎROZ e .